

## Ji ber çi kuştina jinê?

»»» R:9

## Felsefeyek bo jiyanê

»»» R:2

## Çi bi qezencê gel e, bila em vê encam bidin

»»» R:3

## Tevî dagirkariyê, rewşa Artsaxê hîn ne aram e!

»»» R:7

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siyayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (426) 22-07-2022 Buha (1000) Tumen*

# Yada şehîdên Viyenayê bilind hat ragiritn



Bi hilkefta 22'ê Pûşperê di binkeya serekî ya PDKÎyê de rêûresmek bi rê ve çû Roja Duşemî 20ê Pûşpera sala 1401an a Rojî, bi hilkefta 22ê Pûşperê, salvegera "şehîdên Viyenê", li binkeya serekî ya PDKÎ li kempa Azadiyê, rêûresmek hat lidarxistin.

Ew rêûresm bi beşdariya hejmarek ji endamên rêberatî, kadir, pêşmerge û malbatan bi rê ve çû. Rêûresm bi sirûda Netewî ya "Ey reqîb" û ragirtina bîstek bêdengî bo rêzgirtin ji canê pagij yê şehîdên Kurd û Kurdistanê dest pêkir.

Piştre peyama Navenda Siyasî ya PDKÎ ji aliyê endama Navenda Siyasî ya PDKÎ,"Ronak Fethî" ve hat pêşkêşkirin. Piştre ji aliyê pêşmerge û hunermend "Xulam Fatihî" ve sirûda "Qasimlo Dengit bihêz e" hat strandin.

Herwisa peyama hevpar a rêkxiravên weke"Jinan û Lawên yên Demokrat a Kurdistana Îranê û Yekîtiya Xwendikarên Demokrat a Kurdistana Îranê" ji aliyê sekreterê Yekîtiya Lawan "Pêjman Şerî`etî" ve hat pêşkêşkirin. Di dawiyê de sirûda "Ey mamosteyê mezin û zana", ji aliyê zarokên navenda "Nêrgiz" ve hat strandin.

Di kempa "Dêgelê" de yada "şehîdên Viyenê" bilind hat ragirtin Bi hilkefta 22ê Pûşperê, di 33emîn salvegera "Şehîdên Viyenê" de rêûresmek bona rêzgirtin ji yada wan şehîdan hat lidarxistin.

Rêûresim bi xwendina sirûda netewiya "Ey Reqîb" û bîstek bêdengî bona rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê dest pê kir.

Piştre peyama rêberatiya PDKÎ ji aliyê endamê Navenda Siyasî yê PDKÎ "Qasim Keleşî" ve hate pêşkêşkirin.

Piştre ji aliyê pêşmergeyê hunermend "Xulam Fatihî" ve sirûda bi navê "Qasimloyê şehîd" hat pêşkêşkirin.

Di beşek din a rêûresmê de ji aliyê "Nasih Xakî" ve helbesta bi navê "Pûşperke dê" pêşkêşî beşdarbûyan kir.

Di beşek din a vê rêûresmê de peyama Yekîtiya "Ciwanan, Jinan û Xwndekarên Demokrat a Kurdistana Îranê, ji aliyê "Soran Çopanî" ve hat pêşkêşkirin.

Herwisa ji aliyê zarokên "Navenda Nêrgiz" ve sirûda bi navê "Duktorê Zana" hat xwendin. Rêûresim bi dubarekirina soza emegnasî û wefadarî bi rêbaza "Şehîdên Viyenê" bidawî hat.

Roja piştire water roja Çarşemî 22`ê Pûşperê, rêûresimek wekî wan li binkeya "Cejnîkanê" birê ve çû ku vir da peyama 22`ê Pûşperê ji laiyê Teymûr Mistefayî, endamê Navenda Siyasî yê PDKÎ pêşkêşî amadebûyan hat kirin.

Piştire helbesete ji aliyê mamoste "Bêbeş Pîrotî" hat xwadin. Herwisa di beşek dina vê rêûresimê de zarokên girûpa Stêrk, sirûdek pêşkêşî amadebûya kirin. Piştire ji aliyê Şaho Ehmedî ve endamê Yekîtiya Ciwann, peyama rêkxiravên weke Ciwanan, Jinan û Xwandekaran hat xwandin.

Herwisa di beşek din ya vê rêûresimê de, şanoyek ku ji aliyê Şahrox Xosrewî" kadrê PDKÎ ve hatibû amadekirinji aliyê zarokên girûpa "Stêrk" ve hat nimaş dan. Ji aliyek din ve roja Çarşemî 13`ê Tîrmehê beramber digekl 22`ê Pûşperê, rêûesimek ji laiyêl komîteyên PDKÎ yên li welatên Fransa û Bêljîkê li gurstana Pêrlaşêzê li Fransayê hat lidarxistin. Di beşek din de beşek ji gotinên binirx yên şehîd Dr.Qasimlo li ser mezara şehîdan li goristana Pêrlaşêzê belav kirin.

He di heyam rojên derbasbûyî de, çendîn rêûresimên vebîranîn, sîmînar û vêbîrnar li welatên weke Swîs, Danîmark, Swêd, Fîland, Amerîka û Norwêcê , ji aliyê komîteyêln PDKÎ li wan welatan de hatin lidarxisitin.

## Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

# Felsefeyek bo jiyanê



33ê salan berî niha, bi destdirêjiya dil reş, xwastin ku xebateke xwînavî li tijî serbilindî, bê ser bikin, da ku dest bi ser peykerê neteweyekê de bigrin, herwisa di bin berdevka dîplomatîk de, li ser maseya bi navê gotûbêjê bi çekê amade bibûn û Dr.Qasimloyê rêber û hevalên wî terorkirin da ku bi vê xwasta biyom, mejiyê neteweyekê belav bikin û axa vê dagîr bikin û herwisa îrade, nasname û xeyalên wan jî dagîr bikin.

Li heyama 33 salan de, tevî vebîranîna rêber Dr. Qasimlo, biqasî li warên kesayetî, hizr, raman û dîtingeha Dr.Qasimlo de hewl hatine dan, û dê behs jê bê kirin, da kuneviyên îro û paşerojê hinek di vê derheq de bizanin lê, ev behskirinên han demekê ku xwandineke giştîtir û çarçovedartir û armancdartir de nebin, bi lawazî û netevahî derdikevin.

Naskirin û behskirin li derheq Dr.Qasimlo yê rêber de tenê ev yek nine ku, behs ji rola rêberatiya wî di nav Partiya Demokrat de bê kirin, çawan tenê behskirin ji rola rêberatiya wî di nav xebata neteweyî ya Kurd de nine. Behskirin li derheq Dr.Qasimlo de, nikare tenê behs ji xwe hezkirin û rêbaza xwe fîdakirin li pêyxema armancên bilind yên neteweyî de be, çawan ku nabe tenê behs ji zanabûn û şarezabûna wî di siyaset û zanista nasîna civakê de be.

Behskirin li ser Dr.Qasimlo nikare tenê behs ji dewra wî di girêdana xebata Kurd bi xebata beşên din yên Îranê be, çawan ku nikarî tenê behs ji rola Dr.Qasimlo di nêzîk kirina xebata beşên cuda yên Kurdistanê bikî. Behskirin li derheq Dr.Qasimlo de, nikare tenê behskirin li zanaya wî li warên aborî siyasî û raçandina pilanê bo birêvebirina aboriya welatekê be, çawan ku nabe tenê behs ji dîplomatbûn û şarezaya wî li derheq çend zimanan û nûnerê rasteqîne yê gel bûn û gihîştin bi navendên girîng yên dîplomatîk, bona nasandina pirsa neteweya Kurd be.

Behskirin li ser Dr.Qasimlo nikare tenê li ser kesayetiyekî rêberê ku dikare saziyek û partiyekê rêberî bike, çawan ku nikarî tenê behs ji rola Dr.Qasimlo di pêgihandina takan di nav Demokrat de bikî. Nabe tenê behs ji dîtingeha Dr.Qasimlo bo paşeroja civakê û diruśtkirina xeyal û hêvî û armancan bo neteweyekê bikî, çawan ku nikarî tenê behs ji hûrgiliyên bûyerên jiyana rojane ya mirovan bikî ku Dr.Qasimlo bi çi şêwazî wate dida bi wan bûyerên hûr û pêngavên piçûk yên her mirovekê bo jiyanek bextewertir ku behs dike.

Nikarin tenê behs ji girîngîdan û nirxa bilind ya azadî, îradeya serbixweya tak û sazî, mafê wekhevî û heta bo neteweyekê, nirxa mirovî ya wekheviyê bo jinan û amadebûna wan li tevgera giştî ya civak û siyasetê de, behs ji nirxa bilind û wateya kûr ya şehîd, behs ji dadperwerî û civaka dadperwerî, behs ji hezkirina nîştiman, hezkirina jîngehê, rêzdanîn bo kesayetiya takan, dewra rêberîkirin, ber bi pêşvebirina xebat û herwisa jiyana mirovan,

Şêwaza parastina dîrok û şûnwaran, girîngiya kultûr û çand û herwisa destkevtên kultûrî yên Kurd û pirsa girîng a zimanê Kurdî û perwerdehî bi şêwaza neteweyî û dehan tiştên din bikin, weke tenê rehendên hizra Dr.Qasimlo. Belkû bi serxistina tewav ya wan behsan û darêtina beshê weke giştîbûnekê digihîjin bi vê gotina dawiyê ku,

"Kiryar, pêngav, hizr û ramana Dr.Qasimlo felsefeyek in bo jiyanê, bo yên ku jê fêm dikin."

# Çi bi qezencê gel e, bila em wê encam bidin



N: Nûredîn Sofîzade



Gelek caran bas ji berejewendî û xwasta gel tê kirin û heçî aliyek jî ku xwe girêdayî gel dizane û dixwaze pêgeheke bihêz di nav gel de hebe, cehdê dike gorî şiyana xwe wê yekê bike ku daxwaza gel e.

Herwekî em dizanin gelê Kurd ku gelek bê mafe û axa Kurdistanê ji aliyê 4 welatan ve hatiye dagîrkirin, lewma berdewam wê netewê xebat kiriye ji bona bi dest ve anîna maf û azadiya xwe û rizgariya kurdistanê ji dest dujminên dagîrker.

Bo rizgarî û gihîştina bi mafê diyarî kirina çarenivîsê jî, di nav gelê Kurd de part û rêkixistin çêbûne û renge heçî kîjan ji wan aliyan gorî bername û siyaseta xwe rêbaza curek ji xebatê girtibe berahîka xwe û xelk jî gorî berhevdan û bernameya wan part û rêkxistinan, gorî pesenda siyaset û stratêjiya wan partiyan li dewra bernameya wan kom dibin.

Bê guman heçî part û rêkxistinek ku stiratêjiya wê rizgariya Kurdistanê be û li pêxema bidestve anîna mafê neteweyî de xebatê bike, cehdê dike xelkê zêdetir dewra xwe kom bike, û gelek sirûştiye ku rikeberiya bi hêzbûnê di navbera wan part û aliyên xebatkar de jî hebe. Hizba Demokrata kurdistana Îranê, yêk ji wan partiyên sereke û pêşengê xebata neteweyî ye li Rojhilatê Kurdistanê ku dîrokekî dûr û dirêje xebat û qurbanî danê heye bona geheştina bi daxwaziyên neteweyî û rizgariyê, û ew partiye di 76 sal temenê xwe de, berdewam xebat kiriye û qonaxên cuda cuda derbas kirine.

Em bi pişt qahîmîve ku berdewam dibêjin PDKÎ pêşengê xebata neteweyî ye û bi hêztirîn partiya alahilgirê xebatê li Rojhilatê Kuristanê ye û pêgeha herî bi hêz di nava gelê me li Rojhilat heye û qisa yekim dike, bê guman ewa jî, ji wê yekê ve çavkanî digre ku Hizba Demokrat di roja hatî avakirin heya niha tu caran tiştek nekiriye ku derweyî xwast û îradeya gel be.

PDKÎ berdewam xoraka siyaset û xebata xwe ji daxwaz û pêşniyara gel wergirtiye, hertim guhdarê rênimayî û pêşniyar û rexneyên gel bûye, lewmaye ku gel jî wê partiyê bi partî û pêşengê xebata xwe ya netewî dizane û gel jî gorî wê siyaset û stratêjiya Hizba demokrat reftar kiriye û li hemî qonaxên xebatê de, piştewanê wê Hizbê bûye.

Dema gel piştîwanê wê hizbê be, dema gel daxwaz û hivyên xwe li siyaset û xebata wê Hizbê de dibîne, bê guman hez dike ku Hizba wan herim bi hêz û mezin û xwedî bandor be.

Yêk ji daxwaziyên gelê me li Rojhilatê Kurdistanê ji bona bi hêzbûna Hizba Demokrat ewa ye ku ew Hizbe hertim yekgirtî be û yekitiya teşkîlatiye wê parastî be, û hertim heçî gava ku li wê derheqê de pirsgirêkek bo Hizbê hatibe pêş yan netebayî û weqetiya tê de çêbibe, dilê pê êşiyaye û jêve bûne ku derbe ji wan girtiye, wate gel netebayî û weqetiyana têkoşerên wê hizbê, bi weqetiyan û perçebûna ceste û hêza xwe dizanin.

Herwekî hemî aliyek dizanin, mixabin çend caran weqetiyan di nava Hizbê de çêbûye ku ewa jî xisareke mezin bûye ji bona armanc û hêz û xebatê. Dawî weqetiyan ku di sala 2006ê de çêbû, û di wî heyamî de heya niha herdu aliyan li jêr navê Hizba demokrat bi cuda xebat kirine, hizba demokrat li wê derheqê de berdewam kevtiye ber rexne û gazincên gel, û berdewam daxwaz jê hatiye kirin ku refên xwe bêxne ser hev.

Xuyaye ku dilsozî û piştewaniya xelkê ji vê hizbê bûye sedem ku çavnhêrî û daxwazeke wiha ji vê hizbê jî hebin.

Xelkê Kurdistanê, malbatên xwedan qedre Şehîdan, alîgir û endamên vê hizbê, dost û xemxwarên vê hizbê tev daxwaza yekitî û yekgitina hizbê dikirin û givaş dêxistne ser rêberiya herduk aliyan ku dawiyê bi wê 2 Demokratiyê bînin.

Lewma herwekî min berahîkê de bas kir ku Hizba demokrat gorî daxwaz û îradeya gel siyaset û xebatê dike, amade bû hemî cemedan bike av û cehdê bike ku daxwaza gel bîne cih.

Bi keyfxweşî ve rêberiya herdu aliyên Hizba pêşeng ya gel, biryar dan ku wê daxwaza gel hasil bike û pêngav bi pêngav qonax û danûstandina pirsa yekgirtinê derbas kir û mizgîniya yekitî û yekgirtinê di demekî nêzîk de dê bide gel û dê dilê malbatên Şehîdan û gelê Kurd û dost û alîgiran şad bike.

Bê guman hingê ye ku hêvya gel tê cî û çavnhêriya hindê jî he ye ku, xebat û kar ji heçî demê zêdetir bi gur be û ev Hizbe bi erkê neteweyî ye xwe û xebata xwe, destkevtên zêdetir bo gel bi diyarî bîne û bandora wê zêdetir be.
Ewa hêvya gele, lewma Hizba Demokrat jî dixwaze hêvya gel bîne cî û her hizba gel bi

# Armanca rejîmê çikandina bi yekcariye Gola Urmiyê ye



N:Simko



Li meha Tebaxa sala 2011 an meclisa rejîma Îslamî digel gelale û pilan ji bo çareserî û pêşîgirtin ji çikbûna ava gola Urmîyê dijayetî kir û ew pilane ji alîyê karbidesitên rejîmê ve hate redkirin kirin. Gorî lêkolînên ku hatine kirin hişkbûna gola Urmîyê dibe sedem ku bagera xwê li navçên derdora gola Urmîyê çêbibe û berdewam buna belavbûna wê toza xwê dibe sedem ku 13e milyon kes ji nawçên derdora gola Urmîyê bo cihên dûr koç bikin. Rejîma îslamiya Îranê bi çêkirina bendavan û dizîna ava Kurdistanê ji bo herêmên dinêye Îranê dixwaze bi zanebûn kurdistanê hişk bike. Rejîmên yek dû yekêye Îranê ku li heyamî 100 salên derba bûy de her li deselatdarîya Riza şahê Pehlewî ve bigre heya gihîşte rejîma îslamî, bûye sebebê wê yekê ku kurdistan ji alîyê Sîyasî, Ciwakî, Aborî û Çanidî ve paşive bimîne û gelik ji taybetmendîyên xwe ji dest bide ku yek ji wan taybetmenidîyan ev avedanî û şînkatî û sirûştê ciwan û xemilandî û av û hewayê xweşe, ev jî tenê bi çikandina ava Kurdistanê dikare ji nav biçe, gola Urmîyê ger hişk be, li rastî de rejîma Îranê digehîje parek ji armanca xwe ya ji nav birina ciwaniya Kurdistanê.
Lewma li ber wê yekê ku li Îranê de ji alîyê neteweya serdest "Fars" û rejîmên navenda Îranê ve, neteweyên Kurd, Turkên Azerî, Ereb, Beloç û Turkemen jialîy (sîyasî, neteweî, çanidî, ciwakî û Aborî) tên bêparkirin û hertim cehd hatiye kirin ku ev netewane bêna asmîlekirin û helandin û bi wî çavî bera xwe dane wan netewane ku ev jêhatî û layêqê tu cure maf û ciwaniyekê ninin.
Herdûk rejîmên Paşayetî û Îslamî, bi dizîna dest biserde girtina çavkaniyên bin erd wekî ( neft, gaz, ava şirîn) û gelek ji samanên dinê herêmên neteweyên bê maf û xeyrî Farse Îranê, her tiştekî bo xwe bi rewa dizane û dibin û didizin û dixon û didne taxm û girûpên terorîstiye girêdayî bi xwe li derweyî Îranê de, xwastine wan netewên bê maf û yêk ji wan Kurdan ji her tiştekî bê par bikin.

Her ji dema hatina ber basa egera kêm bûn û ber bi hişk bûna gola Urmiyê ve û nîgeraniya ji encama piştî hiş bûnê ku tê çi belayek bête serê wê nawçê û xelkê wê, rejîma Îranê berdewam soza çareserî û pêşîgirtin ji hişkbûna wê golê daye û çendîn caran li organên rejîmê û jialiyê serkomarê rejîmê û meclisê ve kevtiye ber bas û heya niha bi direvde çendîn pilan jêre danane û bûdceya taybet diyarî kirine, lê ew soz û qewlane hemî direv bûne û tenê bi armanca xelk xapandinê bûne.

Gola Urmîyê bi hebuna wan taybetmendî yê xwe yê baş ku dûyemîn gola şor ya mezin li cîhanê û yekemîn gola şor ya mezin li hemî kurdistana mezin tê hejmar kirin û gelik ji taybetmendîyê xwe yê din ku li serê hatîye bas kirin, dikare bibe sebebê wê ykê ku li hemû herêmên Îranê û heya derewey Welat bala xelkê ji bo alîyê xwe rabikêşe, mixabin li heyamê temenê deselatdarîya rejîmên dagîrker û navendî û bitaybetî rejîma Îslamiya Îranê de, gola Urmîyê nekarîye bibe cîhek seyrangeh û cihê torîsm û gerîdan û bala xelkê bo aliyê xwe rakêşe û bibe çavkaniyeke xêrê bo xelkê Urmiyê, îro em bi çavê xwe dibînin ku gola Urmîyê çawa aa xwe ji dest dide û roj li pey roj hişktir dibe.

Rejîma dijî Kurde Îslamî û deselatdarîya dîktatore wê, gelik pîlan û bername ji bo jinavbirina Kurd û Kurdistanê birêve birine ku yêk ji wan pîlanan jî jinavbirina rûyê ciwan û xemilandiye sirûşta Kurdistanê ye, Avên Kuristanê diçikînin, Daristanê Kurdistanê dişevitînin, Xaka Kurdistanê jehrawî dikin bi madeyên kîmiyayî, Rûbar û çemên kurdistanê bi kanalan diherikînin bo nawçên dûrdeste xeyrî kurd, bi lêdana bi hêceta lêdana Bendavan hezaran gund xistne bin Avê û xelkê wan gundan derbi der û bê mal û hal hêlan, û rejnge gelek mînakên dinê jî hebin ku em bikarin amajê pê bikin, rejîma dagîrkar tenê dûjminê canê me Krdan nîne, belkî dujminê can, mal, namûs, xak, dar, av, û ciwaniya Kurdistanê yejî, lewma Gola Urmiyê ku di roja serbestiyê û dûr ji dîktatoriya dagîrkeran dikare bibe serçaveyekî herî bihêze abûrî û ciwan û rakêşerê bala xelkê cîhanê, her nihade pîlana jinav birna wê cîbicî dikin û mixabin rengê hindê dide ku di wê pîlana xwe de serkevtî bin û egera hindê heye tirajîdiyayekî mezine mirovî li Urmiyê û derdora wê bo xelkê û gelê me bête pêş.



# Kirîza mezîn a sindûqên malnişînkiriyan

**N: Namo**
**W: Agirî Enzel**

Sindûqa malnişînkiriyan sindûqek e ku ji aliyê xwediyê kar ve bo parastin û gera sermayeya karmendên kompaniyan pêk hatiye. Herwisa perê wan sindûqan ji aliyê xwediyê kar û karmendan ve hatiye komkirin. Armanca bingehîn a avakirina wan sindûqan, geşedan û bidestveanîna qezenca hêsan bo wan karmendan e ku gihîştine temenê malnişînkirinê.

Pêka datayên fermî, rêjeya mûçexwarên sindûqa malnişînkiriyan li sala 1395an a Rojî ji 4 milyon û 500 hezar kesî ve bo sala 1398an a Rojî, bûye 7 milyon û 100 hezar kes.

Di Îranê de 18 sindûqên malnişînkiriyan hene ku mezintirîn a wan sindûqan, sindûqa “Te`imîn Îctima`î” anku “Dabînkirina Civakî” ye ku 42 milyon kes ji heşîmeta Îranê ji xwe girtiye. Ji gelempera wan 18 sinûqan, bilî sindûqa “Dabînkirina Civakî” tev sindûqên din îflas kirine û ew sindûq jî rastî kirîzê hatiye.

Sedema îflasa sindûqên malnişînkiriyan ew in: “Gendelî, dizî, sipîkirina pere, rantxwarî, dana wama gelek zêde û bê garantî bi kesên cihê şik û gumanê, nebûna dahat bi qasa hewce û xercên sindûqan, nebûna nûjenkirin û nûnebûna şêwaza karê sindûqan, kêmbûna rêjeya beşdarî û danîna sermaye ji aliyê xelkê li wan sindûqan, malnişînkirin li derveyê heyam û destêverdana dewletê li pereyê sindûqan bi sedema kêmanîna bûdceyê”.

Ev yeka di halekê de ye ku dewlet 110 hezar milyard Tumenî deyndarê Rêkxirava Dabînkirina Civakî ye. Sedemên din ên weke aboriya daxistî, bêkarî û nebûna piştevaniya sermaye, kar

lêkerî li ser îflasa wan sindûqane hene.

Ji aliyek din ve, sindûqa paşkevta “Ferhengiyan” li 2 dehkên derbasbûyî de hatiye avakirin û ji sedî 5 a dahata mamosteyan diçe hisaba vê sindûqê; Heta niha asta gendelî li vê sindûqê gihîştiye 15 hezar milyard Tumenî.
Pêka standardên cîhanî, hevsengiya malnişînkiriyan digel kesên ku pereyê mehane yên bîmeyê bi sindûqa malnişînkiriyan re didin, 7 bi 1 hatiye diyarîkirin; Wate 7 kes pereyê bîmeyê bi sindûqê re didin û tenê 1 kesê malnişînkirî mûçeyê verdigre. Lê, pêka amaran di Îranê de ew rêjeya ji 3.5 bi 1 daketiye, anku kêmtir ji 4 kesan pereyê bîmeyê didin û 1 kes mûçeya malnişînkirinê verdigre.

Niha krîza sindûqên malnişînkiriyan li Îranê weke kirîzek mezin tê dîtin ku bûye sedema xwenîşandanên nerizayetî ya piraniya malnişîmkiriyan. Pêka gotina aborînas “Seîd Leylaz”, Îran yekem welat e ku bi vê şêwazî bi berdewamî ber bi pîrbûn û hejariyê ve diçe û tê texmînkirin ku sindûqên malnişînkiriyan li Îranê tûşî hemen qedera sindûqên malnişinkiryan li Soviyeta berê bin ku yek ji sedemên bingehîn ên herifîna Soviyeta berê bûn.

# Dr.Ebas Pehleweî: Lêdana avbendan li ser çemên avrêjên gola Urmiyê yek ji girîngtirîn sedemên kêmbûn û çikbûna ava gola Urmiyê ye



Dr.Ebas Pehleweî

**P:** Dr.Ebas Pehlewanî dikare hindekî xwe ji me re bide nasîn?
**B:**Silav û rêz bo we û spas bo derfeta we.
Ez “Ebas Pehlewanî” me, li bajarek biçûk a bi navê “Qaziyê semelqan” li “Bakûrê Xurasanê” li sala 1970`an jidayîkbûme. Xwandina xwe ya destpêkî û navendî li cihê jidayîkbûna xwe qetandiye, û xwandina xwe ya paşnavendî jî li bajarê “Bucnûrd”ê qetandiye. Lîsansa fakolteya“Jîngehê” jî li sala 1372an li zanîngeha Zanista Werizkarî ya bajarê “Gurgan”ê wergirtiye. Herwisa Karnasiya bilind jî di fakolteya Jîngehê jî li sala 1376`an li zanîngeha “Terbiyet Muderês” a bajarê “Tehran”ê wergirtiye, û her li wê salê ve yanî sala 1376`an di girûpa Jîngeh a zanîngeha Terbiyet Mue`lim a bajarê “Sebiziwar” ku niha navê wê bûye zanîngeha “Hekîmê Sebzêwarî” mijûlî çalakiya me û herwisa endamê heyeta zanistî a vê zanîngehê me jî. Li sala 1391`an jî Dixtoraya Jîngehê jî li zanîngeha “Şehîd Bihêştî” ya bajarê “Tehran”ê wergirtiye. Û koma çalakiyên min yên di warê xwandinê û yê girêdayî bi pirsiyarên we di warê “Amayêşê Serzemîn” de û bi awayekî parastina êkosîstimên jîngeha bajar û gundan û sirûşt û herwisa babeteke ku girêdayî bi pirsên we ye weke êkosîstimên avî û golan weke gola Urmiyê.

**P**: Dr. Ebas Pehlevanî avbendan çi bandorek li ser Gola Urmiyê danîne?
**B**:Bandorên ku me berê texmîn lêdabû mixabin niha rû dane, mezintirîn bandora kirîza jîngehî ku bi jinavçûna gola Urmiyê li ser êkosîstema deverê danaye jinavçûna jiyanê li nav gola Urmiyê ye, mixabin me êdî Artêmiya tuneye yanî êdî jiyan nemaye û av nine û ew rêjeya ava mayî jî Artêmêtiya nav de najîn û Filamîngo jî naçin deverê, lewma navê “Parka Navnetewiya gola Urmiyê” dimîne, lê navê Gola Navnetewî bi sedema kêmbûna balindeyan ji 20 hezarî û nemana jiyanê di wê golê de nemaye û êdî navê “Întêrneşnal Wêtlend” jî me nabe û jinavçûye, divê bê zindî kirin û “Zexîregayên Zîstkure” jî êdî karên hewce li ser golê encam nadin, û bilî vê yekê ji werzêriyên neyasayî yên derdora gola Urmiyê jî namînin, bi sedema vê yekê ku pileya germahiyê zêde dibe û pileya germahiya axê jî zêde dibe û hewayê derdora gola Urmiyê gerim dibe û şorî zêde dibe û bayên ku şoriyê bo deverên derdor dibin ax şor dibe û bi giştî dibe navenda tozê, navenda kirîzan û navenda bayên ku xwê digel xwe belav dikin.
Û bi awayekê jîngeha mirovî ya Urmiyê ku jîngehên girîngin jî rastî arîşe û astengiyan dibin û berhemanînê di vê deverê de kêm dike û koçkirina neçarî li vê deverê de zêde dike.
Ger gola Urmiyê bê zindî kirin û carek din balind bên, û em bi tewawî werzêriyê rabigirin û mafê avê bidine vê golê dikare bibe navendek girîng bo torîstan û ji rêya torîstî ve perê hewce bo xelkê deverê û bo êkosîstema deverê peyda bikin û êdî hewcehiyek bi werzêriyê nabe lê mixabin eva tiştek mehale.

**P:** Dr.Ebas çima hikûmeta Îranê li du dewrên sekomariyê de nêzî 300 milyard Tumenî bûdc bona zindî kirina gola Urmiyê terxand kirin lê rewşa golê neguherî?
**B**:Hikûmeta Îranê li 2 dewreyên serkomariyê de nêzî 300 milyard Tumen bona zindîkirina gola Urmiyê mezaxte kiribû lê, ti guherînek di rewşê de peyda nebû û weke pirojeyên din hikûmetê biryar nedabû ku ti guherînekê bo gola Urmiyê encam bide.
Sedem di vê mijarê de gelek in lê mixabin di tev mijaran de me gotiye pêşîgirtin baştir ji çareserkirinê ye lê belê, nê bi tenê pêşîgirtin nehate encamdan, ew bûdceyên ku hatibûn dabînkirinê jî, rohn nebû ku li kuderê hatine mezaxtekirin.
Ji dûr ve ez li pey rewşê bûm, tîma ku wek tîma zindîkirina gola Urmiyê hatibû binavkirin û di bin çavedêriya Îdareya Parastina Jîngehê ji serdema berpirsayetiya “Kelanterî” li vê

»»» Dom R:6

»»» Doma R:5

Îdareye de rohn nebû ku ev pere di kuderê de hatiye mezaxtekirin. Mixabin di Îranê de biryarên hevpar nayêne dan û ev bûdceya dabînkirî ku biryar bû bo zivirandina ava beşa gola Urmiyê bê kirin, lê ev bûdce di cihên din de hatiye mezaxtekirin.

Em digel vê yekê nin ku avê ji cihek din bo gola Urmiyê bê veguhastin, divê li devera avrêja gola Urmiyê, ava beşa golê bi fermî bê nasîn û bîrên neyasayî bêne xitimandin û av di ekosîstema çeman de biherike û gol bê zindîkirin.

Her pere an bûdceyek li derveyî vê yekê bê mezaxtekirin ku hatiye kirinê jî, mixabin ti guherînek di rewşa gola Urmiyê de çê nekir û herikîna avê bo vê golê nehate zêdekirin û bîrên neyasayî tevî ku nehatine xitimandin, rêjeya wan zêdetir bûne û pêka zaniyariyên berdest biryarek wiha hebûye ku cura çandiniyê jî bê guherîn anku berhemên werzêrî ku hewcehî bi ava kêmtir hene bi cihê berhemên werzêriyên ku hewcehî bi ava zêde hene bên çandin û ev ava ku bi wî awayî dimîne bo beşa gola Urmiyê bi kar bînin lê mixabin ev yek jî nehate kirin.

Herwisa li kêlega çeman de gelek vîla hatine avakirin ku di wan cihan de av bi awayê neyasayî bo berhemên çandinî ên weke daran û herwisa tijîkirina ava hewzan di wan vîlayan de tê bikaranîn û ew berhem tevî ku nayên bikaranîn ti qezencek bo gola Urmiyê tinînin û rewş ji ya heyî dijwartir kiriye.

**P**:Dr. Ev riya 15 kîlometrî ya di navbera Urmiye û Tevrêzê de ye çi bandorek li ser Gola Urmiyê daniye?

**B**:Di derheq rêya di nav gola Urmiyê de gelek gotin hene, pirsyara berê li derheq avbendan bû û xalek ku dibe rohnikrinê li ser bidin ev e me bo lêdana avbendan û çêkirina rê ku du bajarên sereke yên du parêzgehan bihevre girê didin û ji nav golê re derbas dibe bê şik diviya lêkolîna jingehî bihata kirin û me peyvek heye ya bi navê “EIA” anku “Environmental impact assessment” ku diviya karlêkeriya lêdana rê di navbera gola Urmiyê de bihatiba lêkolînkirin ku ev pira dê karlêkerî li ser jîngeh û ekosîstema gola Urmiyê heba an na û berî lêdana vê rêyê ev yek diviya bihata encamdan.

Mixabin yek ji girîngtirîn û destpêkîtirîn sedem bo kêmkirina asta gola Urmiyê lêdana rê li nav vê golê ye ku nediba bihata lêdan, pêka belgeyên ku li ber dest in bersiva lêkolînan jî nerênî bûye û her xwendkarek nû ku derfetnameya vergirtiye û waneya nirxandinê xwendibe dizane ku li hundirê parkên millî lêdana rêyan heta li parkên ku li hişkatiyê de ne destpêregihîştina giştî qedexe ye, parkên millî anku parkên netewî divê pileyek bê xwarê bi wateya “National Park divê bibe Protected Area” anku devera parastî lê mixabin, me biryarê “IUCN” û girîngî bi biryarnameyên saziyên navnetewî neda û heta me girîngî bi biryarên Saziya Parastina jîngeh a Îranê û biryarên wê saziyê jî neda û ev rê hate çêkirin.

Min ew pêşgota li ber vê yekê got ku tekezî li ser vê yekê bikin, lêdana rê li nav gola Urmiyê, ew gol kiriye du beşên cuda ew di halekê de ye ku me pirsgirêka derbasbûnê tunebû û hejmara avbendan jî zêde nebûn û geryana avê li nav golê de zêde nebû lê çêkirina wê rêyê bû sedem ava ku ji aliyê xwarê ve diherikiya wê golê û li wir belav biba, me gotinek heye a li ser navê “circulation system” anku geryana avê, lewma her du aliyên golê bi lêdana rê hatine daxistin û bi tenê averêyek di navbera her du beşên golê de hiştibûn û asta ava golê cudahî hebe û gera berê ya avê bisekine û li du beşan de gelek lezgîntir bibe û li beşa bakûrî ya vê golê zûtir çik bûye û eger em mêzeyî wêneyên esmanî ên vê golê bikin qasa avê bi rengên cuda di vê golê de tên dîtin û asta avê li beşa başûrî de zêdetir e û li beşa bakûrî de kêmtir e lewma ev yeka bû sedem ku kanên binerd ên avê zûtir çik bibin û lêdana vê rêya neyasayî karlêkereyek gelek xirab li ser golê hebûye, dikariîn beşek ji wan rêyên daxistî bi lêdana piran vekin ku gera giştî ya avê li seranserê golê hebe û yek ji rêyên zindîkirina golê çareserkirina pirsgirêka rê ye.

**P**:Bandorên kirîzên jîngehî yên Gola Urmiye li ser ekosîstem û jîngeha deverê çi dibin di demdirjê de? Geloo rêçarek bo wan kirîzan heye?

**B**:Pilanên hikûmetê di vê derheqê de çawan bûne? Belê rêçare heye divê mafê avê bê zivirandin û berdana avê bo golê bi awayekê be ku hevsengiya avê bê zêdekirin ew hevsengî jî di demekê de bandordar e ku rêjeya şoriya avê ji 150ppm kêmtir bike, niha rêjeya şoriya avê zêdetir ji vê yekê ye. Lewma niha em digel golek mirî rûbirûne, çimkî di demekê de ku şorî ji 150ppm kêmtir be Artêmiya û balinde dizivirin û di vê demê de êkosîstema deverê jî carek din zindî dibe.

lewma di qonaxa yekê de divê av bo gola Urmiyê bê zivirandin, bi girêdana bîrên avê yên neyasayî û herwisa rêjeya avên bendavên yasayî û neyasayî û çeman bi awayekî bê kêm kirin ku li ser hevsengiya ava gola Urmiyê bandorêdanê û avê zêde bike.

mixabin bernameyên dewletê di vî warî de nezanistîne û bûdceyên dabînkirî di cihên hewce de hay de mezaxte kirin û bernameyên dewleta Îranê di vî warî de serkevtî nebûne. Û herwisa di vî warî de divê “NGO” yên deverê, xelkê deverê, lêzan û pisporên deverê yên pêkhatî ji gelên cuda yên deverê li zindîkirina wê golê de pişikdar û sozdar bin. Mixabin xelk raste rast qezencekê di zindîkirina gola Urmiyê de nabînin lewma beşdar nabin, û bi wan bûdceyên kêm yên dewletê jî ti karek çareser nabe eger pêdaçûnek giştî bêkirin lê mixabim Ez gelek hêvîdar nînim.

di dawiyê de gotinek pêşîniyan he ye dibêjim: Dibêjin ger çûlemeyekê tijî xîz bidin dest dewletan piştî heyamekê digel kêmbûna xîz rû bi rû dibin. Divê dewlet kar û helwestên xwe ji îdayan bo hêsankariyan biguherin û herwisa tenê dewlet nikare di vî warî de kar bike, divê dewlet alîkarê xelkê be û xelk û rêkxiravên xelkê, zanîngeh, beşên taybet û … hwd jî çalak bin lê mixabin wisa nine.

**P**:Eger gol ziwha be dê çi nexweşiyek pêştî lipey xwe hebin?

**B**:Li derheq jinavçûna gola Urmiyê ku bibe sedema nexweşî an nexweşiyan renge ez nekarin bi serastî navê wan nexweşiyan bêjim, lê girîngtirîn tişt ev e ku kirîzek diqewim e, kirîzek jîngehî ye ku dikare bibe sedema afirandina kirîzên din anku kirîzên li pey hev û hewşêweyê domînoyê li pey hev dibin sedem ku şêwaza jiyana xelkê, ekosîstema deverê, dahata xelkê, curê xwarina xelkê biguhere, lewma jinavçûna jiyanê dibe sedema nemana dahata xelkê û geşeya bidom li deverê bo xelkê li deverê namîne û hejariyê li pey xwe tîne.

Ez wisa hizir dikim ku çendîn pirsgirêk bi hevre dê çê bibin, nirxa erd li derdora golê dê dakeve, koçberiya bi neçarî dê biqewime, û pirsgirêkên civakî dê li wê deverê de biqewimin. Renge li kêlega wan pirsgirêkan de, çendîn nexweşî bi sedema zêdebûna xwê li deverê çê bin ku bi awayekê li ser tendirustiya xelkê bibe gef, di vê derheqê de ez nikarin behs ji ti tiştekî bikim û hewce ye ku lêlolînên pizîşkî li ser vê yekê bên kirin, û eger lêkolîn û ceribandinên pizîşkî bên kirin zêdebûna zext (Fişar) xwîn renge di vê deverê zêdetir bibe û renge nîşan bide ku tendirustiya xelkê li metirsiyê de ye.

Herwisa li warê pîsikolojîkî û aborî, hejarî û bêkarî, givaşek zêdetir bixe li ser xelkê û ew pirsgirêk û bandora koçberbûna bi neçarî dikare xisarên civakî û tawanên civakî zêde bike û gola ku dikare berhemhêner be dikare karlêkeriyek nerînî ya kavilker li ser şêwaza jiyana û dahata xelkê hebe û ew hemû nîşaneke ber bi dijwartirbûne ve herin û em bi cihê peyva geşeya bi dom li gola Urmiyê ber bi kirîzek tarî û kavilker ve diçin.

Di destpêkê de bi lêdana rê di navbera gola Urmiyê û piştre bi lêdana avbendan û bîrên neyasayî li derdora golê û di encam de bi sedema nebûna birêveberiyek serast û bi berçavgirtina jîngehê bûne sedema qewimîna vê kirîzê ku mixabin ber bi başbûnê ve naçe û take mijara ku ez dixwazim behs bikim ev e ku hewçehiya gola Urmiyê li naverasta Asiyayê gola Baykal heye ku çik bû û piştre bi rêçareyên heyî, jiyan bi vê golê re zivirandin, lewma dibe ku gola Urmiyê bê zindîkirin û take rêya zindîkirina vê golê ev e ku em derfetê bidin xweza biryarê li ser bide û em rêgirê proseya zindîkirina vê nebin, rê ji ava çeman bi lêdana avbendan negirin û vê avê hilnegirin, rêya herikîna ava neguherin, bîrên neyasayî lê nedin, bi vê pêkê ew nexweşê ku bi sedema birêveberiya şaş gola Urmiyê kevtiye rewşa jinavçûnê, û hewce ye em bi micidî her wekî dilê kesekî zindî dikin, ku karek dijwar e, herçend ku mumkin e lê bi zehmetiyan tê kirin, û hewce ye peyva xwestin û spartin bi xelkê di vê mijarê de bê gotin.

## Nerîna Lîderan




Aleksandr Lukashenko:

"Divê Şerê Ukraynê bi dawî bê heta şerê navkî neyê kirin".



"William Burns":

"CIA çavedêriyek gelek hûr li ser bernameya navkiya Îranê dike".



Vladimir Putin:

"Em şahidê qonaxeke nû li dîroka cîhanê ne"



Îbrahîm Reîsî:

"Zêdebûna gendelî li Îranê rêkxistinkirî û dariştî ye û bi perê dujminan tê kirin".

# Tevî dagirkariyê, rewşa Artsaxê hîn ne aram e!



N: Eskender Ceiferî

Tevî dagirkirina Artsaxê ji aliyê Azerbaycan û Tirkiyê ve, lê hîn ew li parêzgeha Tawûş a Ermenistanê êrîşî ser sivîlan dikin û wezareta derve ya Ermenistanê jî dibêje ku Ermeniyan topxaneyeke Azerbaycanê têk biriye.

Herwisa wan ragihand ku ji destpêka havînê ve çend dronên Tirkiye û Azerbaycanê têk birine.
Ev heyamek e ku Azerbaycanê bi piştevaniya Tirkiyê dest daniye ser beşeke zêde ji axa Ermenistanê.

Berdewamiya dagirkariya Artsaxê di demekê de ye ku di rojên derbasbûyî de Masîs Mayîliyan wezîrê derve yê Artsaxê bi 40 berpirsên Ustralya re civiya û girêbesteke hevaltiyê wajo kirin.

Nagorno Qerebax an Qerebaxa Jorîn an jî Komara Qerebaxa Çiyayî, ku wek Artsax jî dihat naskirin, dewletek bû ku di asta nevnetewî de bi fermî nedihat naskirin.
Li gor saziya Neteweyên Yekbûyî, ewder, perçeyek ji axa Azerbaycanê ye. Lê di rastî de ewder wek dewleta DEFACTO ji Azerbaycanê veqetiya bû.

Ew, heman dewlet bû ku Azerî û Tirkan têk bir.
Komara Nagorno Qerebaxê li başûrê rojavaya Azerbaycanê ye. Ew li rojhelat bi Azerbaycanê re û li rojava jî bi Ermenistanê re hevsînor e.
Ji danezanîna serxwebûna di 1991'an vir ve, zimanê fermî yê Qerabaxê, Ermenî bû. Lê piştî ku Azerbaycanê dest danî ser vê navçeyê, Azerî kire zimanê fermî.

Tevî ku heşîmeta herî zêde ya vê navçeyê Ermenî ye û hinek Kurd jî li wir dijîn, lê di rastî de ne kesek pişta Kurdan digire ku ew li wir bibin xwedî maf û ne jî kesek bi eşkere pişta Ermeniyan digire. Saziya Neteweyên Yekbûyî ku weke saziya ji bo parastina mafên neteweyan tê binavkirin, ji bo parastina mafê Ermeniyan li wir tev nagere.
Rast e li wir şerê Kurdan nayê kirin lê belê şerê Ermeniyan û hemû wan pêkhateyan tê kirin ku li dijî serdestiya Azerbaycanê li wir tev digerin.
Mijar kûr dibe û di rojên derbasbûyî de Tirkiyê bi awayekî eşkere ragihand ku ewê li hemberî Ermenistanê di eniya Azerbaycanê de bin heya tevahiya navçeyan ji destê Ermenistanê yan jî wê dewletê derxînin ku tenê Ermenitsan li pişta wê ye.

Li gor serjimêriya herî dawî ya Ermenitsanê ku sala 2011'an hatiye encamdan, li vî welatî bi giştî nêzîkî 38 hezar Kurdan dijîn ku ji 35 hezar kes ji wan re Êzidî tê gotin û ew 3 hezar kesên din jî wek Kurd hatine binavkirin.

Helbet tê gotin ku Ermenistan jî qet li mafên Kurdan mikur nehatiye. Lê belê di vê navberê de pirtirbûna heşîmeta Ermeniyan li wê navçeyê, nîşan dide ku ew navçe, mafê Ermeniyan e. Ji xeynî hin gund û navçeyên biçûk ên Azeriyan, lê belê navçeyên din hemû yan jî piranî Ermenî ne.
Li Azerbaycanê jî ji Kurdan re tê gotin Azerî. Li wir qet zimanê Kurdî bi fermî nehatiye naskirin.

Di vê navberê de hin welat jî hene ku dixwazin rewşê aram bikin. Amerîkayê ragehand, ku çekdarên Sûrî ji Lîbya re hatine veguhestin û ew bûye sedema alozî, şer û kuştinên zêdetir.

DYA hweisa Tirkiye hişyar kir û ragehand, şandina çekdarên Sûrî bo şerê navbera Ermenîstan û Azerbeycanê heman alozî û şer û kuştinên li Lîbyayê dê li wê navçeyê jî dubare bike.

Beriya niha jî Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan ragehandibû, heta niha hejmara çekdarên Sûrî li Azerbeycanê geheştiye 850 çekdaran û bendewarî hene hejmarekî zêdetir a çekdaran ji aliyê Tirkiyê ve bên şandin.
Di şerê Azerbeycan û Ermenistanê de bi dehan çekdarên Şûrî yên ku Tirkiyê ew şandine şerê Ermenistanê, hatin kuştin.
Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirov ragihand, di 48 demjimêrên borî de, 36 çekdarên Sûrî yên ku Tirkiyê ew şandine eniya şer, hatine kuştin û bi dehan jî birîndar bûne.
Wê saziya sivîl da zanîn, bi giştî heta niha 64 çekdarên Sûrî li Qerebaxê hatine kuştin.
Tirkiye ku di şerê Qerebaxê de piştevaniya Azerbeycanê dike, hejmarek ji çekdarên opozîsyona Sûriyê tevlî wî şerî kirin. Li gor zanayriyên Rewangehê, heta niha Tikriyê 1200 çekdarên Sûrî şandine şerê Qerebaxê.

Hevdem serokwezîrê Ermenistanê Nikol Pashinyan bang li civata navnetewî kir, da ku pişt rast bibin ku Tirkiye destê xwe nexe nava nakokiyên di navbera wan û Azerbaycanê da li ser herêma Nagrono – Qarabaxê.
Ev hişdarî ya ji aliyê Serok hikûmetê Ermenistanê ve di wî çaxî de hat ku şer di navbera Ermenistanê û Azerbycanê da derketî û Tirkiyê piştevaniya xwe bo Azerbaycanê diyar kiribû.

Balyozê Ermenistanê li Moskowayê Fardan Taganyan jî daye zanîn ku Tirkiye 4 hezar komên çekdar ê Sûriyê bo şer li dijî Ermenistanê bikin bo bereyên şer ê Azerbaycan û Ermenistanê şandine.
Herwiha Fardan Taganyan tekez jî kiriye Tirkiye wan komên tûndrew ê Sûriyê perwerde kirine û dixwaze wan di şerê li dijî Ermenistanê de bikarbîne.
Îranê helwesteke cuda hebû û tenê dixwaze berjewendiyên wê parastî bin.

## Endamên Encûmena Asayîşê ji bo gihandina alîkariyên mirovî bo Sûriyê lihev kirin

Endamên Encûmena Asayîşê ji bo gihandina alîkariyên mirovî bo Sûriyê lihev kirin Lihevkirin li gorî daxwaz û pêşniyarên Rûsyayê hat kirin

Endamên Encûmena Asayîşa Navdewletî li ser dirêjkirina dema mîkanîzma gehandina alîkariyên mirovî ji aliyê Neteweyên Yekgirtî bo Sûriyê lihev kirin.

Ajansa “Frans Press” ragihand, 15 endamên Encûmena Asayişa Navdewletî li ser dirêjkirina mekanîzmaya gihandina alîkariyên mirovî li ser sînorê Sûriyê bo 6 mehan li hev kirin.

Ajansê ji zarê dîplomatan




ragihand ku lihevkirin li gorî daxwaz û pêşniyarên Rûsyayê hat kirin.

Li ser vê lihevkirinê, biryar e îro Sêşemê welatên endamên Encûmena Asayişê deng li ser projebiryara ku ji aliyê Îrlanda û Norwêcê ve hatiye pêşkêşkirin û guhertin tê de hatiye kirin, bidin.

Projebiryara Îrlanda û Norwêcê destpêkê ji bo dirêjkirina gihandina alîkariyên navdewletî ji bo salekê û bêyî hemahengiya ligel Hikûmeta Sûriyê hatibû pêşkêşkirin, lê roja Îna borî Rûsyayê vetoya xwe li hemberê bikar anîbû û ew projebiryar asteng kiribû.

Biryara 2585 a Encûmena Asayişa Navdewletî ya derbaskirina alîkariyên mirovî bi rêya deriyê sînorî yê bi Tirkiyê re (Bab El-Hawa) re bo bakurê rojavayê Sûriyê di 10ê Tîrmeha 2022an de bi dawî bûbû.

Di navbera 4 û 5 milyon Sûrî li Idlibê dijîn, piraniya wan piştî ku deverên ji aliyê rêjîmê ve hatin bombebarankirin, reviyane û koçberî Idlibê bûne. Navenda Nûçeyan (K24) –

## Endamên Encûmena Asayîşê ji bo gihandina alîkariyên mirovî bo Sûriyê lihev kirin

Sûriye pêwendiyên xwe yên dîplomatîk bi Ukraynayê re dibire

Şam radigihîne, li gorî perensîba “serederiya wek hev”, ew jî têkiliyên xwe yên dîplomatîk bi Kîev re qut dike.

Ajansa “SANA” ya fermî yê Sûriyê li ser zarê jêderekî fermî di Wezareta Derve ya Sûriyê belav kir, “Komara Erebî ya Sûriyê li gor perensîba “serederiya wek hev” û wek bersiv li ser biryara hikûmeta Ukraynayê




di vî warî de biryar da ku pêwendiyên xwe yên dîplomatîk bi Ukraynayê re qut bike.”

Ev yek piştî wê tê, Serokomarê Ukraynayê Volodimir Zelensky roja 29ê Hezîranê de ragihandibû, piştî ku Şamê serxwebûna “Komara Luhansk û Donetskê” nas kir, welatê wî pêwendiyên xwe yên dîplomasî bi Sûriyê re birîn.

Ew biryara Zelenskiy piştî wê hat ku Sûriyê berî rojekê serxwebûna komarên Donetsk û Luhansk ji Ukraynayê nas kiribû û bû yekem welat piştî Rûsyayê serxwebûna wan nas dike.

Rûsiya yek ji hevalbendên Şamê yên herî diyar in û ji destpêka şer û pevçûnên di sala 2011an de piştgiriya leşkerî, aborî û dîplomasî pêşkêşî wê dike, bi taybet di Encûmena Asayişa Navdewletî de ku li wir çend projebiryarên li dijî rêjîma Sûriyê asteng kirine. Navenda Nûçeyan (K24) –

## Xelkê Sûriyê bo debara jiyanê xanî û kelûpelên xwe difiroşin

Li navçeyên di bin kontrola hikûmeta Sûriyê de, bi dehan malbatên Sûrî bo dabînkirina xerciyên debara jiyana xwe dest bi firotina xanî û kelûpelên xwe kirine.

Li gor medya Erebî û çavkaniyên xwecihî, niha li Şama paytext û navçeyên di bin kontrola hikûmeta Sûriyê de, bi dehan malbatên Sûrî bo dabînkirina xerciyên debara jiyana xwe dest bi firotina xanî û kelûpelên xwe kirine.

Bi gotina aborînasekî Sûrî niha daku malbateke Sûrî ji 5 kesan pêk tê baş bijî, 3 milyon lîreyên Sûrî pêwîst in.



Li gor aborînasê Sûrî Hisên Cemîl niha mûçeya karmendê hikûmetê 100 hezar lîre ye, di dema 3 milyon lîre bo debara jiyana mehane bo malbata wî pêwîst in.

Li gor heman aborînasî, niha ji sedî 90ê xelkê Sûriye di bin hêla hejariyê de dijîn, û ji sedî 85ê xelkê bêkar in, piraniya xelkê vî welatî jî li ser hewaleyên kesûkarên xwe yên li derve dimînin dijîn. Hewlêr (Rûdaw) -

# Ji ber çi kuştina jinê?



**N: Vênûs Fayîq**
**W:Hesen Mukerem**



Dirindetirîn tawan, tawana kuştina jinê ye, ne mejî û ne lojîk û ne jî ti yasayek piştgîriya vê tawana dirindane nake. Ev yeka jî tenê di civaka mirovahiyê de he ye , di civaka ajelan de, ajel tenê li dema birçî bûnê de û dema îhsaskirin bi metirsiyê, bona berevanîkirin ji xwe êrîşî li ser yektir dikin. Lê, ti ajelek nêr hewla kuştina ajelek din ya mêr nake.Di civakê de ji vê dirindetir tuneye ku bijî û regezek bibe gef li dijî jiyana regeza din.

Di civakên paremayî yên li Rojhilata Navîn de û civaka me de ku parek ji vê civakê ne, piranioya caran tê bihîsitin ku jinek li ser mijara namûsparêziyê hatiye kuştin, di demekê eger tu bixwazî bizanî şeref wateya ti tiştekê digihîjine, heta yê ku tawan encam daye, pênaseyek wisa jêra guman nake bo vê peyvê, çimkî tenê peyveke xemlandî daniye û bi emanete ve xistiye di nav lingê jinan de û her dema ku pê xwe xwar danî pêka eqliyeta eşîra xwe hêjayî kuştinê ye, di demekê de ev kujerê wê ye ku ji şerefê tê bê par kirin. Pirsgirêk di vê yekê de ye ku ev biqasî ku ev tawanên di nav civakê de hatine erê kirin yasaya ku vê qedexe dike hatiye red kirin û bi vê kar nameşînin.

Dawîn car ev pirsa ku girêdayî bi daşkilandina reha peyva "Namûs"ê ye, wateyê eyb û ar" ye û ol bûye ev eyba ku di bin siya vê de vê tawana encam didin. Bi vê wateya ku ayîn rêxweşkere û şeryet da ye pê. Çimkî dawîn car ol bixwe ji vê yekê derbasbûye ku tenê ol be, belkî bûye kultûreke civakiye ku li seranserê civakê de desthilatdariyê dike û ev yek wisa dike ku bijên ev tawan ti yek ji wan di şiyanên kuştina bikom kêmtir nine. Ku tenê bi destkirina di yasayê de darêtinê ded ku vêde birinaq peyva namûsê di nav kultûra zimanvaniyê de û eqlî û civakî diakre pêngavek bê havêtin bona sînordar kirina bo ber bi pilana yasayî ya bicih ya din bona cezakirina bikeran û ji nav birinê vê ye.

Her pêka amarên fermî yên saziyên alîkar dan bi yasaya jinan ku baregeha vê li bajarê Silêmanyê ya girêdayî li Herêma Kurdistanê de ye, tenê li destpêka îsal yanî 2022`an 22 jin hatine kuştin û 31 jin jî dawî bi jiyana xwe anîne û 29 jinî jî agir berdane bedena xwe, di demekê de di heyama sala derbasbûyî yanî 2021`an de 40 jin bi hinceta şerefê hatibûn kuştin û 61 jin jî dawî bi jiyana xwe anîbûn, ev amarên han cihê metirsiyê ne û hêjayî vê yekê ye ku li hember wan bisekinin û pirs bikî ku sedem ti tiştek ku di vê serdemî de jin dirindane û bi berdewamî li hember gefa kuştinê de ye?

Komek sedem hene ku, alîkarin bona befirehbûna wan tawanan û dibe ku:

- Serdest nebûna yasayê û nebûna yasayên mînak bi bê hebûna ti cudahiyeke regeza tawanbaran ceza bidin. Heta deqa yasayan jî altirnatîvekke bê mînak bo cîbicîkirina wan hatiye danîn, û her ev yek jî wisa dike ku bi hêsanî bê binpêkirin.

- Malbata partiyê bo di nav tev warên civakê de bitaybet warê yasa û dadgehan û dadweran de, bi awayek encamderê vê eger piştewaneke hizbî ya piçûk jî hebe di şiiyana vê de heye berahîka keysê ber bi aliyek din de bibe.

- Îhsaskirina kesûkarên jina hatî kuştin bi fedîkirin û rûreşiyê ku wisa dike bi hêsanî ji mafê keçika xwe li ser navê "namûsê", ji bikujê wê xweş bibin, ku ev yek jî bo heyameke qirêja civakê ye. An hinek caran bi piştevanîkirina partiyan rastî gef û givaşan dibin bona paşekêşîkirin ji sikalya yasayî ya wê. Pir caran jî pena xwe bo aştiya eşîrêyî dibin, weke vê ku ev jina hatî kuştin mirov nebûye û mafê jiyanê tune bûye.

- Lawazbûna rola saziyên jinan û afiretan yên ku girêdayî partiyanin û li cem partiyan ev pêş li erka rasteqîne ya wan e. Çimkî ev di bin baskên partiyan de mezin bûne neku li encama şoreşeke civakî û jinan de, her bi vê sedemê ye hertim ez dibêjim ku di civaka me de tevgera jinan tuneye, yaku heye saziya jinan ya hizbî ye û ti yek ji wan saziyan jî bagrevndek hizrî û agahî ya wan tune ye, bilî hizbî bûna wan, çimkî bûdceya berdewamî ya bernameyên wan li hizba xwe werdigrin, eger guhdar nebin gelek bi hêsanî bûdceya wan jê tê qutkirin eger bi wan nedin daxistin.

Nebûna hişyariyê di nav jinan de û herwisa çavtirsandkirina wan ji bo vê ku bêdeng bin û dengê xwe bilind nekin û neqîrin, çimkî bo mîratên civakî û kultûrên olên civakî hertim jin kiriye nêçîrek hêsan ku hêjayê tirsandin û bi kêm zanîn û kuştin e.


Di dawiyê de kuştina jinê û berfireh bûna roj li pey rojê vê yekê radighîne ku civaka me civakeke despotîke ku kultûra tundtîjiyê di nav de serdeste û gihîştin bi qonaxek ji vê baştir temenek dûr û dirêj ji xebata mirovahî û me`irfî dûr ji henaseya hizbî hewce ye , hewcehî bi şoşreke civakî û cemawerî ya seranserî heye ku, mêr mil bi milê jinan bi dengê bilind daxwaz qerebûkirina kermaneta jinê bikin. Ji bo vê ku ev yek jî rû bidin divê destê hizb û ol bê qut kirin û li hikûmet û dadgehan bên dûr xistin.

# Çîroka Xwîna ecem



N: Bêhzad Qadirî

W:Hesen Mukerem




Ev çend salin ku mejûlî resimandinyî?
-Di dema ku min rêdîna xwe tiraşiye karê resimansdinê dikim. Bavê min digot, temenê te ku 11 salî bû dîkilê te dixwand. Lê, ji ber heybeta bavê xwe min nediwêriya simblên xwe bitraşim, piştirebo ders xwandinê çûm bajêr û vir bi kêfa xwe min rêdîna xwe ditraşî, min zû bi zû rêdîna xwe ditraşî, min ji xwe re digot bila rûyê min zû tijî bin û rengê mêran bidim. Bo xwandinê min bera xwe da bajêr, lê xeyalên min pênûs û kaxezên spî bûn, xeyala resmandina rûyê keçikên nazdar yên bajêr. Min rojê bi sed carî xwe goriyê wan dikir û min xwe dikire goriyê wan li renganeveya wan li ser kaxezên xwe.

-Resimên wî demî yên te mane?
-Ne ez qorban, tev bûn bi dûkel û bayê digel xwe birin.
-Îca kîj afirîndeye dilê wî qerar dide ku afirînerên xwe ji nav bibe?

Henaseyek kûr mişt û berdewam kir: Ez evîndarê resimên xwe me weke çawa Xweda evîndarê resimên xwe ye, ew lawên min in, ev lêdana dilên min îhsas dikin, ev dizanin ku ez çiqasî bo wan bavtiyê dikim, dizanin ku ez çiqasî weke dayîkekê wan dihebînim. Rojekê li xwendingehê zivirîm, tîniyê dîtina rûyê wan yê bidarvekirî yên wan di nav odeya xwe debûm, li rê de li xeyala xwe de lêva tev ji wan min digezit, min bêhna lêvên wan dikir û di nav dîtingeha wan de winda dibûm lê, ya ku min didît, bavê min bû, ku li kêlegfa agir resimên min li destê wî de bûn, heb heb resimên min dihavêtin nav agir de û di bin lêvên xwe de nifir li min dikir: Min kurê se şandiye bibe dixtor û endazyar, lê, di wî bajarî de qehbe nemaye ku nerismand be! Ax bêjim bêqîmet ev tişt ji te ra dibin bi nan û av? Heta niha min çend heb pez ji bo wî firotiye da ku di paşerojê de bo min dehên din bikire, lê qongiran mejûlî rehetî derbaskirinê ye. Min çavnhêriya çi dikir û çi hat ser rêya min! hey ho.
- Hestek gelek nexweşe! Mixabin.
- Mixabin ne kurê min e. Jiyane êdî. Her yek ji me bi awayekê dilê me tê şikandin, yek bi mirina dayîk an bav, yek bi mêrkirina hezkiriya wî/ê, yek bi direvan û yek ji dadperweriya rojgar. Dilê min neşkestiye, belkî bûye dûkel di esman de mehf bûye.
- Lê, te her kol neda. Temaşeçeyî wan hemû wêneyên bêmînak bike! Her bi rastî tu hunermendî.
- Wisa ye. Min nekarî ev bim ya ku bavê min dixwaze. Her li ser pêyan di nav wêneyên bidarvekirî yên di nav odeya xwe de xeniqîbûm. Li kale êmr pirs kir: Ev wêneyan bi pênûsê nehatine resimandin! Bo resimandina wan ji çi tiştekê mifah hatiye wergirtin?!”
-Li şileyeke taybet ku berhema min bixwe ye, şileyeke sirûştiye.
-Keçik heyrîmayî ma û bi çavên xwe heb heban, di hundrî porteran dibû. Li pêş her yek ji wêneyan de derbas dibû, ji kalemêr pirsek dikir. Kalemêr li ser kursiyek kevin yê darberoyê rûniştibû, xeyalan ev digel xwe birbû, bi pirseke din keçika pirsyarkar zivirî û got: “Piştî vê ku bavê te ew wêne şewtandin te çi kir”.
-Her vir da min kirêka xwe rakir û zikê bavê xwe tirî tirî kir.
-Tu rast dibêjî?!
-Kalemêr pêkenî û got: “Na ezbenî. Îca çawan dibe ji ber çar kaxezan ku qehbeyên bajêr li ser hatine resimandin ez bavê xwe bikujim?!”
-Min gelek bi micidî got, dilê min teqiya!

-Bi lorîn ve revîm, nezivirîm û êdî bavê min ez nedîtim. Min serê xwe rakir û beraxwe da bajarê eceman. Berdewam nekir, rohndkan kora çavên wî xwaribû. Keçikê got: “Ez îhsas dikim ku ti bîra bavê xwe dikî.
-Na lawo. Ev zilma ku tê berçavên min, xemgîn dibim. Wî tenê afirînderên bedeviyên min nekuşt! Wî, tev bedeviyên li dil û mejiyê min de kuştin. Her ji ber vê yekê bû ku min bera xwe da ecemistanê.
Wî hezar carî ez birîndar kirim xwîna min rijandin, evîn û hezkirin ji min standin, ez hûr û wêran kirim. Min hezar carî hêvî dixwast ku vê demî bavê min ez jî digel wêneyên min dişewtand û dibûm bi xawely, lê piştî şewtandina wêneyên min, hezar carî şewtîm û nemirim.
Keçikê dev ji wêneyan ber neda û li hemberî kalemêr rûnişt: “Xalo ji bo min behs bike, hundrî xwe vala bike”. Çima tu wisa dizanî ku min xwe vala nekiriye?!
-Keçikê ti tiştek negot û çavnhêr bû ku kalemêr biaxiv e.
-Tvî wan wêne û resiman, îro dibînî ku minberhemên xwe valakirine di heyama wan sala de.

-Rica dikim xalo ji bo min behs bike.
-Min bera xwe da ecemistanê û neçar bûm ku kedkariyê bikim. Temenê min tenê 15 sal bû, lê zehmetrîn kar bi min didan kirin. Wan dizanî ku ez kurdekî bê kesûkar û penaber im, û bi zileya li min dixistin, ji min re axavtinên nerêde digotin. Min odeyek piçûk kirê girtibû, û gele bi zehmetî kirêya vê dida û bi zehmetî zikê pê têr dikir. Car car kaxez û pênûs jî min dikirîn û ji xwe re resim diresmandin, lê weke Kurdistanê vir şûnda min ti resimên keçikên bedev nerismandin, êdî min îhsas bi ti bedeviyekê nedikir, di hundrî min de tev bedevî miribû. Tenê û tenê min porterên wan gevadan diresimand ku zile ji min xistibûn û perê min dixwarin.

Keçik di nav rûyê kalemêr de winda bibû û wî jî qoltek av vexwar û berdewamî da axavtina xwe: Êdî wiha min jiyana xwe derbas kir û temenê min çû serê û har bibûm û wisa ji min hat ku tu kesî nediwêrî perê min bixwe. Min pere bixwe kom kir û avahiyek mezin kirê kir û çûm be daxwaza keçike kurd û ew jî li mêje ve vir bûn û dijwarî û zehmertiyên zêde dîtibûn.
Dubare cigarek agirê berdayê.

Piştî vê ku min jiyana hevpar pêk anî min wisa dizanî ku tev xem û kovanên min dawî pê hatine, min îhsas dikir ez bûme mêr û nêreke û kerê dixesînim lê…
Lêbelê çi?!
Êdî ronhdikên wê nehatin sekinîn û li ser rûyên wî yên qermçî de şimtîn, dengê wî lerzî: Şevekê sê hevalên min yên ecem li mala min de bûn, çendîn salan me bi hevre kar kirbû û me hatinûçûna hevdu dikir, di xweşî û nexwaşiyan de em bihevre bûn, me nan û xoy kirbû yek. Amadebûn canê xwe jî ji wan re fîd bikim her evqas ji bîra mine û pê dikeniyan û me ça vedixwar û bi girî û qîrîna jina xwe ez haydar bûm?
Wan nemirovan û wan bê şerefan wan bênamûsan, derman dabûne min. hevjîna min…
Êdî nekarî biaixive. Peyvê hundrî dilê gezt. Xoyek sar da. Weke şeq şeqê direcifî.
Keçik li kêlega kalemêr hişk bibû. Ode jî ji bo bistkê di nav bêdengiyê de xenqî bû.
Kalemêr bi zehmetî û tire tir axavt û got: Wan bênamûsan dermand dabûne bi min û bi kom dest dirêjî li hevjîna kirin. Her di vê şevê de hevjîna min agir berda bedena xwen

»»» Dom R:11

»»» Doma R:10

Çawa dikarî li hember wan hemû sivikatiyan bisekine? Çawan dikarî digel wan azaran jiyanê derbas bike? Niha jî qîrîn û nalînên wê di guhê min de dizringin.

Hensayek kûr mişt û berdwam bû: Min jixwe re got pisîra kîj kurê se bigirim? Îdalet li kîj qehbexaneyê ye da ku pisîra vê bigirim? Pişta min bi kîj bira û kîj bav germ be? Di vê ecemsitana bêreh de pena xwe bo kê bibim? Heyamek derbas bû, min bixwe ji yek ji bênamûsên ku destdirêjî li ser hevjîna min kirbû û mala min şevtandibûn veşartbû. Revand û li mala xwe de heps kir, min jê pirs kir: Çima we ev yek anî serê min? Wî tenê hevokek ji min re got: Rêberê me fermana cîhadê daye. Kuştin û serjêkirin û destdirêjkirina li ser we helale, ey mirovê gêj.

Biborîne biborîne, min fêm nekir!
-Min jî bo yekem car fêm kir keça min. Lê tenê çend roj li 28 Gelawêjê derbas bibû!

-Wê sala ku “Xumeynî” li dijî Kurdistanê fermana cîhadê derxistbû?
-Belê keça min.
-Ez bêagehdar li nîştiumana xwe û ew jî guhdarê axatinên rêberê xwe bûn.
-Piştre zivrîm bo Kurdistanê?
-Na min jî biraya xebatê standin û ev jî bi şêwaza xwe.
-Te, çek hilgirt?!

-Kalemêr li cihê xwe de rabû û ber bi resimên bidarvekrî ve meşiya û sê heb ji wan digel xwe anîn û rastdestî keçikê kirin.

-Piştre li ser cihê xwe rûnişt. Keçikê dest û tiliyê xwe li ser rûyê resmande anî û pirs kir ev sê mêr kêne?
-Ev sê mêrên ku di vê şevê de di mala min de mêhvan bûn. Keçik heryî mayî mabû. Nedizanî çi bêje! Got: Gelek ecêbe! Çima tu dibî roxsarê wan mirovan biresmînî ku agir berdana mal û hale te?!
-Kalemêr bersiv da: Her yek ji wan porteran bi xwîna xwediyê wan jidayîk bûne, tev ji wan tev ev porteran yên ku di vê odeyê de dibînî bi xwîna xwediyê xwe jidayîk bûne.
Wir gurstana eceman e keçika min wan cîhad dikirin û min jî xebat. Bera xwe bide bi wan hebek du heb nin, min bi sedan ji wan kuştine. Min dilê wan di nav singe wan de derxist û bi xwîna pîs û gemar, ev tabloyên han afirandin. Lê, sed mxabin ez gelek zû pîr bûm hêza min nema. Zimanê keçikê nediziviri û çavên xwe di nav odeyê de diziviran û temaşe dikir! Temaşeyî xwîna eceman dikir.

# Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

## Kolberek li sînorê Newsûdê bi sedema teqeya hêzên leşkerî, hate birîndarkirin

Êwara roja Pêncşemî 30ê Pûşperê li sînorê Newsûdê, kolberek Kurd ê bi navê “Ekber(Ekrem) Xudamuradî” xelkê gundê “Banî Sakan” ê girêdayî bajarê “Selasa Bawecanî” bi teqeya hêzên leşkerî birîndar bû.

Hêzên leşkerî bi bê agehdarkirina berê û li nêzîk ve, teqe li wî kolberî kirine.

Di vê teqeyê de gozîng û serçoka vî kolberî bi gulleyên saçmeyî birîndar bûne.

Ew kolbere bo çareseriya pizîşkî bo navendên dermanî hatiye veguhastin.

## Dalaho/ Jinek temen 50 salî hat qetilkirin

Roja Yekşemî19`ê Pûşperê welatiya bi navê “Golçîmen Necefî” temen 50 salî û keça Ebdula û xelkê bexşa Gehwarê ya ser bi bajarê Dalahoyê, ji aliyê hevjînê xwe ve bi awayek dirindane hat qetilkirin.

Yek ji xizimên nêzîk yên Golçîmen Necefî ji Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê re ragihandiye: Êvarêya roja Şemî 18`ê Pûşperê, Golçîmen Necefî ,ji aliyê hevjînê xwe ve bi sedema nebûna avê li malê de, bi lêxistinê hatiye qetilkirin.

Herwisa vê çavkaniyê zêde jî kiriye ku: Golçîmen Necefî 34 salan berî niha li ser rizamendiya xwe digel Elî Rezayî zewicîbû û hevjînê wê bi hinceta ku zarokên kur çê nedibûn hertim Golçîmenê dixist.

Vê çavkaniyê ev yek jî daye zanîn: Elî Rezayî piştî qetilkirina Golçîmenê, termê wê, 2 kîlometran dûr ji rêya gundê “Banî Bîd” cihê rûniştana xwe biriye û ragihandiye ku hevjîna wî di bûyera qezaya tirafîkê de canê xwe ji dest daye.

Herwisa vê çavkaniyê ragihandiye: Polîsê trafîkê û karnasên naveda peywendîdar piştî serdana cihê bûyerê û encam dana lêkolînên karnasî îlankikirin ku, Golçîmend Necefî di bûyera trafîkê de canê xwe ji dest nedaye ji ber ku hatiye qetilkirin.

Golçîmen Necefî xwediyê sê keçikan e û her sê ji wan jî jiyana hevpar pêk anîne.

Heta niha Elî Rezayî hevjînê Golçîmen Necefî nehatiye destbiserkirin û ev serbest e.

Herwisa rêûresima bi axê spartina Golçîmen Necefî li gundê Miwalî Necef yê girêdayî bajarê Serpêla Zehawê birê ve çû ye.

# Agirî

- Rojnameya "Agirî" di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (426)


## Wêneyên bidawî hatina dewreya destpêkî ya pêşmergayetî











